Socialstyrelsen

# Zanyarî ji bo te ku Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî werdigirî

Miqayîtbûnaa li gorî Qanûna LRV’yê

Ji bo kesên bin 18 salî ku miqayîtbûna psîkîyatrîya dadwerî werdigirin, belavokeke cihê heye.

Ev belavok li gorî Qanûna Mafê Kopîkirinê hatiye parastin. Di dema vegotinê de divê navê çavkaniyê were anîn. Veberhemanîna wêne, dîmen û vîdyoyan hewceyî destûra nivîskar e.

Ev belavok bi awayê PDF li ser malpera Desteya Neteweyî ya Tenduristî û Refahê berdest e.
Di rewşa daxwazê de, em diakrin vê belavokê di formeta dewsgir de ji bo kesên astengdar biweşînin. Pirsên xwe yên têkildarî formetên berdêl û cihê bo adresa alternativaformat@socialstyrelsen.se bişîne.

ISBN: 978-91-7555-637-6

Hejmara babetê:  2024-9-9203


Weşandî: www.socialstyrelsen.se, Îlona 2025an

# Naverok

Te mafê xwe yê wergirtina miqayîtbûna baş heye 4
Kî biryar dide ku li gorî LRV’yê heta çi heyamekê divê miqayîtbûna min were kirin. 7
Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye 10
Dibe ku hinek maf werine sînordarkirin 15
Telefon û komputer û name 15
Karmend dikarin kelûpelên te seh bikin 17
Serdan 17
Kiryarên neçarî 20
Te mafê xwe yê nerazîtînîşandanê heye 20
Heke tu nerazî yî yan pirseke te heye 20
Ferheng û kurtkirî 20
Jêderk 20

# Te mafê xwe yê wergirtina miqayîtbûna baş heye

Miqayîtbûn divê ji bo te û kesên din ewleh û dilniya be. Miqayîtbûn divê bi rêzgirtina li nirxa wekhev ji bo tevahiya gel û hurmeta kesane pêk bihê.  Karmendan divê fêrkarî û pisporiyên pêwîst hebin.




## Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya qanûnî çi ye?

Çareserkirin li gorî Qanûna Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya Dadwerî (LRV) tê wê wateyê ye bijîşk an dadgehê biryar daye ku pêwîst e bi şêwazeke neçarî û li gorî naveroka Qanûna Miqayîtbûna Bijşkiya Derûnîya Dadwerî miqayîtbûnê wergire. Armanca Miqayîtbûna Bijîşkiya Derûnî ya Qanûnî raberkirina terapiyê ji bo şert û mercên bijîşkiya derûnî, kêmkirina metirsiya vegeriyana li sûc û tawanê û dabînkirina şert û mercên pêwîst ji bo vegeriyana li civakê ye.

## Kengî ez dikarim bo Miqayîtbûna Bijîşkiya Derûnî ya Qanûnî bihême veguhestin?

Miqayîtbûn li gorî Qanûna LRV’yê dikare ji bo kesinan pêk bihê ku:

- Li ser biryara dadgehê bo Miqayîtbûna Bijîşkiya Derûnî ya Dadweriyê hatine spartin,
- hatine desteserkiirn, di hebsa demkî de ne yan di yekeyeke vekolandina bijîşkiya derûnî
- ya dadweriyê de hatine razandin, li nav zîndanê ne

yan biryar e ku bo zîndanê bihêne veguhestin.

- Tu tûşî aloziyeke derûnî ya ciddî yî.
- Hewceyîya te bi miqayîtbûna derûnî ya şevûrojî heye.
- Te li hember miqayîtbûna ku hewceyî wê yî, li ber xwe daye.

Heke tu li ser destûra dadgehê bo Miqayîtbûna Bijîşkiya Derûnî ya Qanûnî hatiyî vegerandin, du şertên destpêkê, tevî biryara dadgehê ji bo wergirtina miqayîtbûnê têrê dikin. Ji bot e ku di girtîgehê de yî, li girtîgeha demkî dihêyî ragirtin, li yekeyeke vekolandina bijîşkiya derûnî ya dadweriyê de hatiyî razandin, an li zîndanê yî yan biryar e ku bo zîndanê bihêyî veguhestin, divê merca sêyem jî derbasdar be.

# Kî biryar dide ku li gorî LRV'yê heta çi heyamekê divê miqayîtbûna min were kirin.

Eva ku kî biryar dide ku divê di bin miqayîtbûnê de bî û kengî miqayîtbûn tevav dibe, girêdayî bi şert û mercên te ye.

## Ji bo kesên ku bo Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî hatibne veguhestin

Heke te tawanek pêk aniye ku sizaya wê zîndan bûye û aloziya te ya derûnî ya ciddî heye, dadgeh dikare te li Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya Qanûnî vegerîne. Ev babet li Qanûna Sizadanê (BRB) da hatiye rêkxistin. Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî li beşa miqayîtbûna girtî de dest pê dike.

Biryara seretayî heta çar mehan derbasdar e. Heke dadgeh biryar bide ku Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya Qanûnî bihê domandin, dibe kuherî pirr bo şeş mehan bihê dirêjkirin. Tu sînordariyek ji bo hejmara carên ku dadgeh dikare miqayîtbûnê dirêj bke, tuneye.

Dibe ku dadgeh biryar bide ku tu dikarî di rewşa dabînkirin şert û mercan de di bin Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya qanûnî ya azad de cih bigirî. Ew serokê bijîşkî ye ku divê daxwaza Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî ya vekirî bike. Ev tê vê wateyê ku heta wê demê ku şert û mercên taybt ên dadgehê li ber çav bigirî, hewce nake kuy bi awayê şev û rojî li nexweşxaneyê bimînî. Ev diakrin hin şert û merc bin ku divê dermanekî taybet bi kar bînî yan tv li terapiyê bibî. Dadgeh dibe ku biryardana derbarê van şert û mercan bispêre bijîşkê payebilind. Heke tu şert û merêcn miqayîtbûna azad li ber çav negirî, dikarî dîsan miqayîtbûna razandinê wergirî.

## Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî kengî bi dawî dibe?

Dibeku tu bêyî yan digel nirxandina taybet a rehetbûnê, bo Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya qanûnî bihêyî veguhestin.

Heke hikmê Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî ya bêyî ”vekolandina taybet a rehetbûnê” li te hatibe birrîn, bijîşk divê hertim seh bike bê ka gelo du mercên pêwsît ji bo Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî hema wisa derbareyê te derbasdar in an na. Heke tu vîkarî nekî, êdî nabe ku bikevî bin miqayîtbûnê.

Heke bi nirxandina taybet a rehetbûnê, hikmê Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya Qanûnî li te bihê birrîn, dadgeh biryar dide ku gelo divê di Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya qanûnî de bimînî yan na.

## Jibokesên ku hatine desteserkirin, girtin an jî di rewşa derbaskirina heyama mehkûmbûna xwe di zîndanê de ne.

Ji bo te ku hatiyî desteserkirin, di girtîgeha demkî da hatiyî ragirtin an di rewşa derbaskirina hikmê zîndanê de yî, dibe ku terapî li gorî Qanûna LRV’yê pêwîst bike; helbet piştî vêya ku bijîşkek te miayîne bike û tê derxe ku şert û mercên pêwîst derbasdar in. Di miayîne bijîşkî de divê ev derfet ji te re were raberkirin da ku pirsgirêkên xwe şirove bikî. Herwisa divê te hin zanyarî li ser hegera hewceyîya bo miqayîtbûnê berovajî meyl û xwesteka xwe wergiritibin. Piştra bijîşk bawernameya miqayîtbûnê dinivîsse.

Beriya wê yekê ku bikarî çareseriyê wergirî, pêwîst e ku bijîşkekî din te seh bike û vê yekê binirxîne ku çareserî li gorî LRV’yê pêwîst e.

## Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî kengî bi dawî dibe?

Heke tu yek ji van pêwîstiyan êdî nehê sepandin, miqayîtbûn divê bi dawî bibe.

Heke tu hatiyî desteserkirin an zîndaniyê demkî (hikmê desteserkirina demkî) de yî, Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwrî divê herî pirr demekê bi dawî bibe ku êdî di rewşa desteserkirî de nebî.

Armanca miqayîtbûnaa li gorî qanûna LRV'yê ev e ku rewş û halê te heta radeyan pêkan baştir bibe, da ku bikarî bêyî neçariyê terapiya pêwîst wergirî.

# Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye

Karmend divê zanyariyan bi awayekî radestî te bikin ku bikarî pirsên xwe tê bigihêjî û bibersivînî.

Mafê te yê wergirtina zanyariyan heye, him li ser miqayîtbûna ku niha werdigirî û him heke ji bo pêşerojê planek jê ra hatiye danîn.

Tu xwedan maf î ku bizanî ku derman, terapî û karên ku di heyama dermankirina te de pêk tên, çawa dikarin bandorê li te bikin.

## Te divê bernameyeke miqayîtbûnê hebe

Karmend divê herî zûtir ji bo miqayîtbûna te bernameyekê çê bikin û heta radeya pêkan vîkarî digel te bixwe pêk bînin. Tê de divê bihê nivîsîn ku çi cûreya miqayîtbûna te pêwîst e.

## Zanyarî li ser çareserî û dermanan

Pêwîst e karmendê têkildarî ji te re bibêje ku çawa çareserî û dermanên cihêwaz bandorê li te û leşê te dikin. Her wiha ev mafê te ye bizanî ku gelo terapiyê xetereyek heye, eva ku piştî demekê bikaranîna derman dibe ku çi biqewime û çi dûhatên wê yên pêreyî dibe ku hebin.

Te ev maf heye ku heta
dema ku mebesta
karmendan tê
negihîştiyî, bipirsî.

## Mafê te ye ku bo te bixwînin ku karmend çi dinivîse

Mafê te yê xwendina plana xwe ya miqayîtbûnê heye. Heke pêkan be, karmend divê plana miqayîtbûnê tevî te amade bikin. Herwisa mafê te yê xwendina qeyda bijîşkî ya xwe heye. Heke bijîşk wê yekê binirxîne ku dibe ku hest bi xirabtirbûnê bikî yan miqayîtbûna te xirabtir dibe heke tiştekî di tomara bijîşkî de bixwînî, dibe ku ew zanyarî ji te re bihêne veşartin. Di wê rewşê de te ev maf heye li dijî biryara li ser dosyeya xwe li Dadgeha Venihêrandinê (Kammarrätten) nerazîtî nîşan bidî.

## Kî zanyariyan li ser te werdigire?

Rêzika serekî ev e ku tu biryar didî ku kî li derveyî wê tîmê ku miqayîtbûna te dikem, zanyariyan li ser miqayîtbûna te werdigire. Ev jî bo raberkirina zanyariyan bo xizm û kesên din berbelav e.

## Miqayîtbûn anegorî nihênîbûnê pêk tê

Nihênîbûn bi wê wateyê ye ku rê nadine karmendan ku li cem aliyekî din qala tenduristiya te yan babetên te yên kesane bikin. Ji ber vê yekê, veguhestina zanyariyan tenê piştî vekolandineke nihênîbûnê pêk tê. Zanyarî dikarin bi rezamendiya te bixwe jî werin dayîn.

Di hinek mewqiyan de derfet an jî heta erka dayîna zanyariyan heye. Di hin babetan de, xizmetên civakî û miqayîtbûnên tenduristiyê dikarin navbera beşên xwe zanyariyan bidin û bistînin, heke ev kar ji bo dayîna çavdêrî, terapî yan piştevaniya pêwîst bo te hewce be.

Di Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya vekirî (serpêyî) de, plandarêştineke hevaheng ji bo terapiyê pêwîst e. Ev yanî divê qaseke zanyariyan derbareyê te digel wek mînak şaredariya cihê jiyana te yan saziyên din ku biryar e miqayîtbûn û piştevaniya ji te bidomînin, werin danûstandin.

## Zarok wek xizm û kes

Heke zarokek xizm û kesê te ye, pêwîst e karmend bi taybet pêdiviyên zarok ji bo zanyarî, fêrkarî û piştevaniyê li ber çav bigirin. Herwisa divê digel pêdiviyên takekesî yên zarok û asta têgihîştina wî/wê da guncaw be.

## Te ev maf heye ku kesekî piştevaniyê hebe

- Kesekî piştevan ji aliyê Desteya Nexweş (patientnämnden) dihê bijartin û di heyama ku li gorî LRV'yê di bin terapiyê de yî û mehek piştî wê, piştevaniyê dide te.
- Kesê piştevan di babetên te yên kesane de alîkariya te dike, diaxive û demê diogel te derbas dike.

## Qanûnên têkildarî kesên piştevan

Dibe ku kesê piştevanê te bi awayekî rêkmend were hevdîtina te, lê carinan dem û pêvajoyên rêveberiyê dikarin serdanan kontrol bikin. Ji bilîhevdîtinan, ev kes dikare di dema civîn û gotûbêjan di Dadgeha Kargêriyê de jî alîkarî û yarmetiyê bide te.

> Erka kesê piştevan piştevaniya ji te ye.

Kesê piştevan erka nihênîbûnê derbarê tenduristî û zanyariyên te yên kesane heye. Wateya wê yekê ev e ku ew tenê di babetên taybet û îstîsna de dibe ku kesên din haydar bike.

## Bi vî rengî kesekî piştevan werdigirî

Karmend divê derdem ku te hest kir ku têra xwe halê te baş e, van zanyariyan wergirî, ji te bipirsin ku gelo kesê piştevan dixwazî yan na. Ev desteya rawêjkariya nexweşan e ku kesek piştevan ji bo te diyar dike. Heke dixwazî kesê piştevan biguherînî yan heke giliyekî te heye, dikarî digel karmendên miqayîtbûnên civakî yên Komîteya Nexweşan

> Li her navçeyekê komîteyek heye ku erka wê piştevanî û alîkariya bo nexweşan û xizm û kesên wan ji bo wergirtina zanyariyan û vegotina nêrînên xwe bo pergala miqayîtbûnên tenduristiyê ye.

biaxivî.

# Dibe ku hinek maf werine sînordarkirin

Dema ku tu dibin Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî de yî, hinek ji mafên te dibe ku bihêne sînordarkirin.



# Telefon û komputer û name

Di pirraniya rewşan de ev maf jibo te heye ku digel xizm û kesên xwe wek malbat û heval û kesên din ku bo te giring in, di têkiliyê de bimînî. Loma tu dikarî di dema miqayîtbûna xwe de digel her kes ku dixwazî pêwendî çê bikî.

Di babetên îstîsna de, dibe ku tu ji bikaranîna telefon an şêwazeke din ji bo danîna têkiliyê digel kesekî li derveyî nexweşxaneyê werî qedexekirin. Ev tenê di wê demê de guncan e ku pêwîst be bo miqayîtbûn an jî baştirkirina te bo ku ziyan û zirarê li kesekî din nedî.

Te hertim ev maf heye ku nameyekê ji parêzer, rwêjkarê giştî yan jêderka gelemperî re bişînî û nameyan wergirî bêyî ku karmend wê bixwînin. Halbûkî, krmend dibe ku pêwîst be ku nameyên ku ji bo te tên seh bikin da ku piştrast bibin ku li nava wan elkol, madeyên hişber an tiştin tunene ku zirarê digihînin te an jî rêkmendiya nexweşxaneyê aloz bikin. Heke karmend tiştine wisa bibînin, mafê wan heye ku wan ragirin.

### Beş bi asta ewlehiyê ya 1 an 2

Heke tu desteserkirî, zîndanî yan mehkûmbûyî bo Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwrî bi vekolandina taybet a rehetbûnê bî û di beşeke bi asta ewlehiyê ya 1 yan 2 de bî, tenê îzna te heye ku komputer an telenekê bi kar bînî ku beşa terapiyê dide ber destê te. Di vê heyamê de, karmend divê komputer an telefona kesane ya te ragirin.

## Karmend dikarin kelûpelên te seh bikin

Heke bijîşk vê yekê pêwîst bizane, karmend dibe ku seh bikin ku te hinek alav û amûr hene ku destûra te ya hilgirtina wan tuneye. Dibe ku elkol, madeyên hişber yan her tiştekî din be ku zirarê li te yan kesekî din bide.

Di heyama vekolandin û sehkirinê de, karmend dikarin kinc û çenteya te seh bikin. Dibe ku ji te bixwazin ku cil û bergên xwe bi awayê demkî ji xwe bikî da ku piştrast bibî ku tiştê ku te destûr tuneye li beşê digel te hebe, hilngirî. Pêwîst e sehkirin bi rêzgirtina li te û leşê te pêk bihê.

## Serdan

Te ev maf heye ku di heyama dewreya miqayîtbûnê de digel kesên ku i te re giring hevdîtin pêk bînî. Kesên ku dixwazî serdana te bikin, diakrin di saetên hevdîtinê de bihêne nav beşê.

Di babetên îstîssna de, dibe ku serdanên te bihêne sînordarkirin. Ev yek dibe ku ji ber vê yekê be ku serdan bibine sebeb ku halê te xirabtir bibe.

## Çalakî û mijûlatiyên li derve

Li cihê ku li te miqayît dibin, pirrî caran derfeta çalakiyên rojane û çalakiyên sergerm û biserkirina demê li derve hene. Di babetên îstîsna de, ev maf dibe ku werine sînordarkirin. Ev yek dibe ku ji ber vê yekê be ku ev çaalakî dikarin halê te xirabtir bikin.

Lê belê dema ku Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî werdigirî, bêyî destûrê mafe te tuneye ku beşê yan qada nexweşxaneyê biterikînî. Ji bo kirina vî karî divê îzna te ya bijîşk hebe.

Heke hikmê Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî digel vekolandina taybetî rehetbûnê li te hatibe birrîn, dadgeh biryar dide ku gelo te destûr heye qada nexweşxaneyê biterikînî (mirexesî yan rehetbûn). Dadgeh dikare desthilata biryardana bo mirexesî û rehetbûnê bide bijîşk.

## Ev maf ji bo te heye ku tê de beşdar bibî

Heta wê astê ku pêkan e pêwîst e ku çavdêriya tenduristiyê bi rawêjkariya digel nexweş were plandarêştin û cîbicîkirin. Ev jî bi wê wateyê ye ku pêwîst e zanyarî li ser nirxandin û pêşniyazan ku pêwendiya wan bi çavdêriya te heye, werbigirî. Herwiha pêwîst e ku heta radeya pêkan rê ji bo beşdariya biryaran têkildarî miqayîtbûna te werevekirin. Di heman demê de, hin sînordarî jî ji bo beşdariyê hene.

# Kiryarên neçarî

## Tenê wek rêçaareya herî dawî

Di Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya razandinê de, bijîşk dikare di babetên îstîsna de hin kiryaran pesend bike ku tam berovajî meyl û xwesteka te bin. Ev şêwaz wek kiryarên neçarî dihêne binavkirin û tenê demekê pêkan e bihêne bikaranîn ku hemî bijardeyên din bi dawî hatibin.

Heke tu ketiyî bin kiryareke neçarî, divê di dosyeya bijîşkî ya te de bihê destnîşankirin.

## Dermanpêdana bi neçarî

Heke naxwaazî dermanan bi kar bînî, karmend dibê heta radeya pêkan rêzê li wê yekê bigirin. Heke rewşa te ewqasî ciddî be ku bijîşk tê derxe ku divê dermanekî taybet bikar bînî, di wê rewşê de dermanterapî ya neçarî rêpêdayî ye.

## Girêdana bi kemberê

Bijîşk dibe ku biryar bide ku tu divê bi kemberê bihêyî girêdan, lê tenê di rewşekê de ku xetera bilind a zirardîtinê hebe û bi tu şêwazeke din pêkan nebe. Tu wextî nabe ku zêdetir ji heyama ku pêwîst e, bihêyî girêdan.

Tu kesî mafê xwe tuneye gefa girêdana kembera te bixwe yan jî te ji kesên din cihê bike.

- Dema ku bi kembrê bihêyî girêdan, divê ji kêmî her çar saetan carekê ji aliyê bijîşk ve sehkirin û nirxandin ji bo te pêk bihê.
- Tu sînordariyek li ser hejmara biryarên ku bijîşk dikare bide, tuneye. Lê derdem ku êdî tu hegerek ji bo vêya ku kember bihê girêdan, tunebe, tu yê bihêyî berdan.
- Karmendên miqayîtbûna tenduristiyê divê di hemî demê de li nav odeyê digel te bin.

## Cihêkirin – li odeyê bimîne

Bijîşk dikare biryar bide ku te cihê ragire; wek mînak derî kilîl bike yan pêşiya te bigire ku nekarî ji odeyê derkevî.

Îzolekirin (qerentînekirin di odeyeke cihê de) tenê di rewşekê de pêk tê ku tevgeriyana te acizker an hêrişkerane be û bibe sebeb ku miqayîtbûna ji nexweşên din pirr dijwar bibe.

- Dibe ku herî pirr bo heyama du saetan werî cihêkirin. Heke biryar e ku heyameke zêdetir di tenêtî û tecrîdê e bî, bijîşk divê biryareke cidî bide ku herî pirr du saetan derbasdar e. Di hinek şert û mercan de, biryarek dikare amaje bi heyama diyarkirî bike ku ji heşt saetan zêdetir be.
- Tu sînordariyek ji bo hejmarea biryarên ku bijîşk dikare bide tuneye, lê qey ku tevgeriyana te êdî miqayîtbûna ji kesên din dijwar bike, divê bihêyî berdan.
- Karmendên çavdêriyê divê di navbirên rêkûpêk de rewşa te seh bikin.

### Gotûbêj piştî kiryara bi neçarî

Heke tu di nava kiryareke bi zorê de bûbî, divê derdem ku şert û merc rê bidine te, pêşniyaza gotûbêja digel karmendan bidine te. Ev gotûbêj divê piştgirane bin û derfetek bin da ku ezmûnên xwe bînî ziman. Ev gotûbêj herwiha dikare derfetek jibo karmendan be da ku baştir tê bigihêjin ku çawa dikarin alîkariya te bikin da ku êdî hewceyîyek ji bo bikaranîna kiryarên neçarî tunebe.

# Te mafê xwe yê nerazîtînîşandanê heye

Heke tu wisa difikirî ku ew biryarên têkidlarî miqayîtbûna te hatine dayîn şaş in, dikarî li cem Dadgeha Kargêriyê nerazîtî nîşan bidî. Lê belê hemî biryar nakevin ber venihêrînê.

## Karmend divê ji te re bibêjin ku çawa vîê karî bi cih bînî

Tu divê haydar bibî ku kîjan biryaran dikarî îtiraz bikî. Divê ji te re bihê şirovekirin ku çawa îtiraz bikî û çawa nameyeke nerazîtiyê binivîsînî. Divê ji te re ragihînin ku te maf heye ku nûnerek an alîkariya mafevaniyê bikar bînî û eva ku di hin babetan da te maf heye ku parêzer an alîkariya mafevaniyêya dewletî hebe.

## Rawêjkarekî gelemperî dikare yarmetiyê bide te

Dema ku tu li dijî biryarekê li Dadgeha Kargêriyê derdikevî, dadgeh di hin babetan de divê parêzer an alîkariya mafevaniyê ya dewletî ji bo te tayîn bike. Lê belê heke diyar be ku hewceyîyek bi parêzer an alîkariya mafevaniyê tuneye, dadgeh ji bo te alîkariya mafevaniyê ya dewletî tayîn nake.  Wergirtina alîkariyê ji rawêjkarê giştî belaş e.

# Heke tu nerazî yî yan pirseke te heye

Hertim dikarî digel karmendên miqayîtbûnê yan bijîşkê xwe biaxivî. Ew alîkariya te dikin û berpirsyar in di vê yekê de ku miqayîttbûneke baş werdigirî.

## Bi meyl û meraqeke tevav serdana min bike!

## Nêrîn û piştevanî

Di 1177 de dikarî şêwaza danîna nêrîn an giliyê xwe derbarê miqayîtbûnê zêdetir bixwînî. Here ser malpera 1177.se û bêjeya ”Heke tu razî nînî” lê bigerre. Herwiha tu dikarî bi lêgerîna ”Ji miqayîtbûnê razî nînî” li ser malpera socialstyrelsen.se zêdetir bixwînî.

Di 1177 de herwiha hin zanyarî li ser lijnyên piştevaniya nexweşan û malbatên wan tên radestkirin. Li wir tu dikarî digel kesên ku ezmûn û serpêhatiyeke weke te hene, têkilî dayînî. Here adresa 1177.se û li bêjeya ”Lijneya nexweşan û pêwendiyên têkildar” bigerre.

Heke bikaranîna komputerê ji bo te qedexe be yan sînordariya te hebe, dikarî digel karmendan li ser tiştên ku di terapiya xwe de ji wan nerazî yî, biaxivî. Herwiha tu dikarî ji karmendan bixwazî ku alîkariya te bikin hin zanyariyan li ser lijneyên nexweşan û xizm û kesan bi dest bixî; lijneyên ku digel kesinan dixebitin ku LRV'yê di bin terapiyê de ne.

# Ferheng û kurtkirî

| | |
|---|---|
| **Serokê Bijîşkî** | Bijîşkek ku pisporê bijîşkiya derûnî ye û berpirsê Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî ye. |
| **Dadgeha Kargêriyê** | Dadgehek ku dikare têkildarî Miqayîtbûna Neçarî biryar bide. |
| **Biryara wergirtinê** | Biryarek derbarê Miqayîtbûna neçarî ku divê beriya hatina nav miqayîtbûna neçarî were dayîn. Bijîşkek ku biryara wergirtinê dinivîse divê pisporê bijîşkiya derûnî be. |
| **Kesê pêwendîdar** | Kesek li nav karmendan ku berpirsyariyeke taybet jibo têkilîdanîna bi te re heye. |
| **LRV** | Qanûna miqayîttbûna bijîşkiya neçarî ya qanûnî. |
| **Mirexesî û îzin** | Derfetek ji bo hebûna li derveyî navçeya nexweşxaneyê bi tenê, wek mînak li malê. |
| **Miqayîtbûnaa neçarî ya razandî** | Miqayîtbûna neçarî li nexweşxaneyê bi awayê şev û rojî. |
| **Bawernameya miqayîtbûnê** | Bawernameyeke bijîşkî ya seretayî ye ku Bawernameyeke bijîşkî ya seretayî ku ji bo miqayîtbûna neçarî ya te pêwîst e. |

| | |
|---|---|
| **Plana Miqayîtbûnê** | Hin belge ku derman û babetên din ên hewceyî te di heyama miqayîtbûnê de şirove dikin. |
| **Miqayîtbûna neçarî ya derûnbijîşkiya azad** | Dibeku neçar be ku hin dermanên taybet bi kar bînî da beşdarî terapiyê bibî,lê hwce nake ku bi awayekî 24/7 li nexweşxaneyê bî. |

# Jêderk

Rêzikên ku ji bo hemiyan dihne sepandin, di Qanûna Tenduyristî û Xizmetên Bijîşkî (HSL) de, Qanûna Nexweşan û Qanûna Ewlehiya Nexweş (PSL) tên dîtin.

Qanûnên taybet ên têkildarî Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî di Qanûna Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya Dadwerî (LRV) de hatine.

Qanûnên têkildarî nihênîbûnê di Qanûna Destragihîştina Giştî bo zanyarî û Nihênîbûnê (OSL) hatine tayînkirin.

*Ev babeta ragihandinê li gorî rêzikên din hatiye amadekirin ku jibo Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî tên sepandin. Ji bo hêsantirkirina têgihîştina zanyariyan, hinek têgih û bêjeyên mafevaniyê hatine serrastkirin.*

Hin zanyarî ji bo kesên ku hwceyî miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya qanûnî ne

Socialstyrelsen

Zanyarî ji bo te ku Miqayîtbûna bijîşkiya derûnî ya dadwerî werdigirî – Terapî li gorî Qanûna LRV'yê (Hejmara xalê 2024-9-9203) dikare ji malpera me were daxistin yan ji beşa weşanê ya Rêxistina Xizmetên Civakî (Socialstyrelsen) were siparîşkirin.
www.socialstyrelsen.se/publikationer